PolitikART

KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

01 Cotmeh 2022 Şemî

HEJMAR : 309

# Civaknasiya ji bo civakê



WÊNE: Max Pechstein



WÊNE: Sajjad HUSSAIN / AFP

Xelk li ser textê ji rêûresma Hindistanî, "çarpay" rûniştiye, li devereke avê dayî ser. Ji ber barana zêde ava çemê Yamûna bilind bûye li Delhiya Nû. Wêne 28´ê Îlona 2022´yan hatiye girtin.




WÊNE: Hussein Faleh / AFP

Alîgirekî lîderê Şîî yê Iraqî Muqteda El-Sedr, li Besrayê 28´ê Îlona 2022´yan li hember hêzên ewlekariyê yên Iraqî di dema protestoyekê de cixareyê dikişîne.

**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Roger Turaut **politikart@yeniozgurpolitika.org**

# Bi maskeya objektîfbûn û zanistîbûnê dagirkirina heqîqetê

Ji dehan salan ve, û bi taybetî ji salên 2010'an heta roja me ya îro, gelek xebatên akademîk li ser tevgerên civakî hatin weşandin. Li her derê, li fakulteyên akademîk, xwendekar û lêkoler hene ku li ser tevgerên civakî dixebitin. Ji sala 2014'an ve hejmara lêkolînên li ser Kurdan bi giştî û bi taybetî jî li ser tevgera azadiya Kurdistanê zêde bûn.

Li aliyekî, em dibînin ku xebatên cihêreng zêde dibin. Li aliyê din, em dibînin ku di destê desthilatdaran de xebatên wisa, herwiha bi roleke wiha radibin ku armanca wê rêveberiya ferasetê (perception management) a vê tevgerê bi xwe ye. Beriya her tiştê, pewîst e ku mirov li vê yekê jî baş serwext bibe: Di dîrokê de, rola zanistê ji bo tevgerên azadiyê herdem pirr giring bû. Lê herwiha, zanîngeh yan jî înstîtuyên akademîk ji sîstema dewletan ne dûr in. Heta, em dikarin bibêjin ku îro, ji berê zêdetir, dewlet bi rêya xebatên întelektuel, li bin ala çêkirina zanistê, berjewendiyen xwe bi pêş dixin. Rê û rêbazên dewletan li aliyekî, em dibînin ku zêhniyeta navendî û lîberal rengê xwe dide xebatên gelek kesan jî. Rengê xwe bi taybetî di beşa zanista tevgerên civakî de dide der.

### Rêbaz û tehlîlên ji rêûresmê

Em ê mînakekê bidin ji van xebatên li ser tevgera azadiya Kurdistanê; gelek lêkoler îro dixwazin zanibin, gelo gotinên vê tevgerê rastî ne yan propaganda ne? Weke rêbaza lêkolînen xwe, gelek kes rêyeke wisa dişopînin: Çend hevdîtin, çend xwendinên kitêban, hinek li Kurdistanê yan jî li nav diasporaya Kurdî geriyan, hinekî şopandina ragihandinê û medyaya dijîtal. Gav bi gav, weneyek ava dibe li ber çavan. Dibînin ku îdeal û rastî herdem naşibin hev. Her tişt ne li gorî gotinên bîrdoziyê ne. Rastî zehmettir e. Tehlîlên wisa jî bi wate ne. Lê ji bo watedayina tevgerên ewqas rengorengo, gelo ev nihêrîn têrê dike?


Dilar DÎRÎK

Sûc ne yê lêkoleran e, mesele bi giştî bi zanistên civakî ve giredayî ye. Di dîroka zanistan de, rêbazên pozîtivîst gelek caran derfetên mezin dane desthilatdaran. Li ser navê objektîfbûn û zanistîbûnê, dagirkirina heqîqetê ji bo armanca desthilatê û armancên hiyerarşiyê hatin bikaranîn. Lê belê, tevî ku tevgerên alternatîf (herwiha teoriya femînîst, rexneyî, antî-kolonyal û wekî din) rê û rêbazên pozîtivîzmê rexne dikin jî, heta îro ev wek rêbaza herî rewa tê dîtin. Edebiyata tevgeran – danheva wan a dehan salan ku bi têkoşînê çêdibe - wek zanîst nayê dîtin. Tê gotin, nihêrîna şoreşgerekî nebe perspektîf, mirovên siyasî nikarin bibin pêşkêşvanên fikiran – bi bîrdozî ne, objektîf nînin. Dayikek yan bavek ku zaroka xwe di şêr de ji dest bide, nikare rexneyê li sîstemê bike, mirovên bê perwerdeya sîstemê, nikarin aqil bidin civakê – hest û mejî ji hev re cuda ne. Jinek ku behsa jiyana xwe ya şexsî dike, tenê dikare behsa vê tiştê bike, yanî destûr nîne ku ji jiyana xwe tehlîla sîstemên mezin û gerdunî bike. Zarokek ku kevir diavêje tankên dagirkeran, nabe mijarek ji bo civaknasiyê, zarok nikarin bibin kirdeyên siyasî. Bi vî şiklî, cihanên civakî yên ji derveyî sîstemê, ji desthilatê re dûr, ne wek cihên çêkirina zanistê tên dîtin. Mentiq ev e ku heta ku kesek yan gotinek di saziyen sîstemê re derbas nebe, ew nebe zanist yan jî çêkera zanistê.


Karl Schmidt-Rottluff: Maskeya xwar, 1961

### Sîstema navendî maneyan dagir dike

Îro gelek kes, înstîtu, think tank û wekî din, raporan li ser demokrasiya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilata Sûriyê derdixin. Lê bi giştî, ew nabêjin, referansên ku li Rojava dibin bingehê avakirina civakeke demokratîk û yên têgihiştinên demokrasiya lîberal a sîstema navendî ji hev cuda ne. Li sîstema navendî, konseptên wek demokrasî, azadî, hiqûq û geşedan li gorî standardên kapîtalizmê têne nirxandin. Ev standard jî ji aliyê saziyên wek World Bank, International Monetary Fund, Freedom House û wekî din tên diyarkirin, yanî saziyên ku bi sîstema desthilatdar a rojavayê cihanê ve giredayî ne van standardan datînin. Bi gotineke din, sîstema ku ji sedan salan ve li cihanê hemûyî dagirkerî, şerr û bêadaletiyê belav dike, niha wateya konseptên giring wek azadî yan demokrasiyê li gorî zêhniyet û berjewendiyên xwe terîf dike. Wateya wan tiştan ji aliyê ristên navendî, kapîtalîst û mîlîtarîst ve tê dagirkirin. Bêguman, standardên wisa jî nikarin bibin rêyek ji bo fêmkirina hedefên sîstemên alternatîf. Ji ber vê yekê, lêkolînên li ser xwezaya demokrasiya Rêvêberiya Xwêser jî nikarin vê sîstemê li gorî pîvanênên pozîtîvîst ên sîstema navendî terîf, rexne yan jî tehlîl bikin. Bi gotinekî din, di nav têgihiştinên navendî de, ji bo tîştên wek têkoşîn, bîrdozî û wateya şehîdan ji bo pêvajoyên şoreşger, cih nîne. Ji bo fêmkirina sîstemên alternatîf, rê û rêbazên cuda pewîst in.

### Xwedûrkirina ji têgihiştinên akademîk ên lîberal pêwîst e

Wek gelek tevgerên li dijî sîstemê, tevgera azadiya Kurdistanê, bi taybetî bi rêya Jineolojiyê perspektîfên alternatîf derdixe holê. Wek perspektîfeke polîtîk, li ser dîrokeke ji derveyî sîstema dewletê israrkirin, ne bi tenê meseleyeke teorîk e. Avakirina têgihiştinên li dijî sîstemên dagirker, herwiha rêbazeke pedagojîk e, yanî bi daxwazê ve girêdayî ne ku xilaskirina zêhniyetên rewa ji dewletê dixwaze. Bi gotineke din, israrkirina li ser şiroveyên ji yên sîstema navendî cuda, herwiha avakirina danûstandinên dîrokî û civakî yên nû ye. Ev xwestin, ji aliyê tevgereke azadîxwaz bi xwe ve giring e, weke dîroka civakî li dijî dewletê.

> Dibe ku gelek kes hene yên ku gotinên tevgerên şoreşger yan jî yên li dijî sîstema desthilatdar, tenê wek propagandayê dibînin. Lê herwiha gelek kes hene ku hewl didin ku van danhev û mayeyên şoreşger wek kaniya zanisteke cuda bibînin, ji wan perspektîfê bigirin û fikrên nû li gorî vê bi pêş bixin. Ji bo serketina vê yekê jî, di nav siyasetvan, çalak û nivîskarên Kurd de jî pêwîstî bi xwedûrkirina ji têgihiştinên akademîk ên lîberal heye.

Niha, rewş ji berê cuda ye; bîrdozî û pratîka tevgerên azadiyê zêdetir cidî tên girtin. Dibe ku gelek kes hene yên ku gotinên tevgerên şoreşger yan jî yên li dijî sîstema desthilatdar, tenê wek propagandayê dibînin. Lê herwiha gelek kes hene ku hewl didin ku van danhev û mayeyên şoreşger wek kaniya zanisteke cuda bibînin, ji wan perspektîfê bigirin û fikrên nû li gorî vê bi pêş bixin. Ji bo serketina vê yekê jî, di nav siyasetvan, çalak û nivîskarên Kurd de jî pêwîstî bi xwedûrkirina ji têgihiştinên akademîk ên lîberal heye.



# Zanistên civakî bi mîsyoneke nû

Ev demeke li Zanîngeha Rojava ya li Qamişloyê di asta lîsans û mastirê de bernameyên xwendina civaknasiyê hene li Înstîtuya Zanistên Civakî. Me sala 2020'an dest bi bernameya mastirê kir. Armanca sereke ew bû ku em xwendekaran amade bikin da ku ew bi xwe bibin mamosteyên zanistên civakî li Zanîngeha Rojava. Yek ji sedemên damezrandinê, ji aliyê Zanîngeha Rojava bi xwe ew bû ku gelek xwendekaran miracaetî zanîngehê kiriye, xwestiye zanibe ka çi cihêtî di navbera zanistên civakî li Rojava û deverên din ên dinyayê de heye. Zanîngeha Rojava li ser zemîne paradîgmayeke nû hatiye avakirin. Ev paradîgma di çarçoveya Şoreşa Rojava de ji sala 2012'an û şûn ve di pratîkê de jî pêk tê anîn. Zanîngeha Rojava jî dixwaze bibe yek ji pêşengên ji bo avakirina civakeke nû be. Herçî em weke Înstîtuya Zanistên Civakî dikin, ew e ku em beşa civaknasî û zanistên civakî bi pêş bixin.



Dr. Sardar SAADI*

Zanistên Civakî li cîhanê xwedî dîrokeke dûr û dirêj in. Mirov dikare heta fîlozofên serdema Yewnan, fikirdarên Misra Kevin û şaristaniya dewletdar a Mezopotamyayê jî biçe. Wekî zanistekê, esas weke disîplîneke zanistê, di sedsala 19'an de Ewrûpiyan ew çêkiriye. Bi taybetî jî rola Auguste Comte di bipêşxistina civaknasiyê weke zanistê, heye. Çarçoveya fikra wî bi xwe li ser esasê pozîtîvîst bû. Yanî wî dixwest rêûrêbazên zanistên xwezayî, fenî û matematîkê di nava zanistên civakî de jî bi kar bîne. Yanî ev zanist nekete xizmeta civakê, bileks ew kete xizmeta şaristaniya Ewrûpayê. Piştî Auguste Comte, gelek kes hatin û teoriyên weke "beridîna civakî" derketin pêş. di çarçoveya vê de civak û şaristaniya Ewrûpî weke yên herî bipêşketî hatin nîşandan. Li ser vî esasî gelên mêhtingeh ên kolonîkirî kêm nîşan dan. Û wan xwe ji wê neda alî ku xetekê di nav felsefe û civakî de nîşan bidin û bibêjin, tevahiya civakan divê bibin weke yên Ewrûpî. Encama vê yekê jî ew bû ku li temamê cîhanê bindest belengaz û bextreş bibin, şerên cîhanê biqewimin, û niha jî dinya hemû di tehlûkeyê de ye. Jixwe krîza avhewayê jî nîşanî me dide ku mirov wisa li ser xwezayê bûye serdest ku tehlûke li ser man û nemana me heye.

### Di nava sîstemê de jî rexne lê hatin girtin

Di vê çarçoveyê de gelek kes bi salan e ku rexneyan li zanistên civakî digirin. Ji salên 1950'î û pê ve û heta beriya wê jî kesên weke Dubois, teorîsyenên ku li ser esasên rêgez û nijadê rexne li zanistên civakî girtin derketin holê yên weke Fanon û paşê bi teoriyên femînîst rexne bi pêş ketin. Piştre li ser teoriyên antîkolonyal û postkolonyal pêvajoyeke rexnekirinê da der. Tevî ku beriya wan teoriya Marksîst jî rexne li zanistên civakî digirt, ew rasterast ne li dijî pozîtîvîzmê bû. Piştî ku di salên 1960 û 1970'yî de bîra postmodern jî derket holê, rexneya li pozîtîvîzmê ya di nav zanistên civakî de bêhtir bi pêş ket.

> Cihêtiya sereke ya Zanistên Civakî li Rojavayê Kurdistanê ew e ku binçîneyekî radîkal û rexnegir ji xwe re hildibijêre. Helbet em civaknasiyê, berhemên wê wan dixwînin, lê li ser esasê binçîneya radîkal û rexnegir em dixwazin lêkolîn û xwendina xwe ya li zanîngehê bimeşînin. .

Em li Rojava dîrokan bîra zanistên civakî û zanistên siyasî jî dixwînin. Em ji destpêkê ve rexneyî li wan dinihêrin. Em rasterast têkiliyê datînin di navbera civakên zanistî û jiyana rojane ya li Kurdistanê, paradîgmaya nû de ya ku esas e ji bo Şoreşa Rojava. Cihêtiya sereke ya Zanistên Civakî li Rojavayê Kurdistanê ew e ku binçîneyekî radîkal û rexnegir ji xwe re hildibijêre. Helbet em civaknasiyê, berhemên wê wan dixwînin, lê li ser esasê binçîneya radîkal û rexnegir em dixwazin lêkolîn û xwendina xwe ya li zanîngehê bimeşînin.

### Dekolonîzekirin li Kurdistanê û cihê wê di zanistên civakî de

Li Kurdistanê û nexasim li Rojava, em çi xebatê bikin jî, beşek ji wê elaqedarî ji mêhtingeriyê rizgarkirinê [dekolonîzekirinê] ye. Ji ber ku mirovê Kurd bi dehê salan e ku hatiye kolonîzekirin. Wî nekariya hêza xwe di têkiliyên aborî, siyasî û civakî de nîşan bide. Yanî di tevahiya warên jiyanê de derfeta mirovê Kurd çênebûye ku îradeya xwe nîşan bide: zimanê xwe nexwendiye, çanda xwe bi azadî geş nekiriye, pê nejiyaye. Li Başûrê Kurdistanê jî ji salên 1990'î û bi şûn ve tecrûbeyek heye, wekî din hin caran dewletên mehtinger jî dibe ku destûra xwendina Kurdî bidin. Lê me fêm kir ku rizgariya ji mêhtingeriyê ne tenê li ser ziman e, ew her wiha li ser cîhanbîniya me, li ser rêbazên têkiliyên me li gel zanist û li gel rastiyên jiyanê ye jî. Meseleya rakirina mêhtingeriyê, li nav gelên xwe cihî ev bi salane, ji mijarên behsa zanistî ne jî. Teorî, rêbaz û pratîkên wê jî em dibînin. Bi vê jî em bi rehetî dibînin ku ew ne tenê derbarê parastina ziman û çandê de ye, tevî ku ew beşeke girîng a rizgariya ji mêhtingeriyê ye. Ew her wiha derbarê serweriya mirov e da ku li ser jiyana xwe siberoja xwe bi biryar be.

Li Instîtuya Zanistên Civakî ya Rojava, em dekolonîzekirinê wekî pêşengiya ji bo rizgarkirin û bi pêşxistina tevahiya gelên li herêmê dibînin, nexasim îro ji bo Sûriyê. Dekolonîzekirin li Sûriyê ne tenê li ser esasê ziman û çanda Kurdî ye. Ew li ser rizgarkirina mirovên Sûrî û herêmê ye da ku xwedî biyar be li ser siberoja xwe û ji bo têkiliyên xwe yên aborî, siyasî û civakî xwedî îrade be. Yanî ji bo rêbazên me di zanistên civakî de û her wiha ji bo meseleya têgihiştina me ya di dekolonîzekirinê de vegerandina hukimraniyê li ferd û civakê, meseleya me ya esasî ye.

Di bernameya me ya havînê de jî diyar bû; em ranabin, tenê teorî û rêbazan naxwînin, lê em her wisa dixwazin têkiliyan deynin ligel tevahiya tevgerên ku li cîhanê di çarçoveya dekolonîzekirinê de kar dikin. Weke xwecihên li bakur û başûrê Emerîkayê, li Efrîkayê û li gelek cihên din ên cîhanê.

### Dekolonîzekirina xwezayê û cinsên civakî

Dekolonîzekirin, bi awira me derbarê wan têkiliyên me de ye yên ku bi xwazeyê re danîne. Yanî mesele ne tenê têkiliyên me yên bi civakê û sîstemê re ne. Pêdiviya têkiliyên me yên bi xwezayê re jî hewceyî dekolonîzekirinê ye û em berê xwe didin vê yekê jî. Pozîtîvîzm dekolonîzekirinê esas red dike, ji ber wê jî rexneyeke esasî ya li pozîtîvîzmê bê girtin ew e ku zanistên civakî rêzê bigirin ji xwezayê re jî.

Aliyekî din jî têkiliyên cinsên civakî ye. Li Zanîngeha Rojava beşa Jineolojiyê heye û ew weke şoreşekê ye di warê zanebûn û zanista jinê de ku li ser esasê bîr, bawerî, raman û rêbazên jinan civakê ji nû ve dinirxînin. Jineolojî û esasbûna raman û fikra jinê beşekî sereke ye di wan zanistên civakî de ku em dixwazin bi pêş bixin.

### Yekser di nava civakê de ye

Zanistên Civakî yên ku em li Rojava niha bi pêş dixin, têkiliya xwe ya yekser bi heqîqeta civakî ya li Rojava re heye. Di çarçoveya Şoreşa Rojava de nûbûneke civakî li Bakur û Rojhilatê Sûrî çêbûye. Li cihê cih têkilî û nirxên nû yên civakî çêbûne. Ev ji bo gelek kesan û bi giştî ji bo civakê jî nû ye, ev ji bo wan jî wekî şoreşekê ye. Li Rojava mesela nimûneya bihevrejiyana gelan, ji nû ve bi hev re avakirina civakê heye. Yanî ew tecrûbeyên li Rojava ji bo tevahiya Rojhilata Navîn nimûne ne. Ji ber ku em dizanin, bi dehê salan e arîşe û alozî di navbera gelan de li Rojhilata Navîn hene, her tim rê vekirine li ber şer, malwêranî û bextreşiya gelan. Niha em dibînin li cihê herî zehmet, li cihê herî nemumkin, ya nû tê avakirin. Em dibêjin, Rojava sozek daye, ew jî soza mumkinbûna avakirina ya nû ye. Ew dibêje, hewce nake em sîstem û têkiliyên berê ji nû ve ava bikin yan jî wan tekrar bikin. Em li Rojava dibînin, ya nû dikare bixebite û li deverên din ên herêmê û dinyayê jî dikare pêk bê. Li ser vî esasî deh xwendekarên me - 6 mêr û 4 jin in û îsal em ê hin xwendekarên din jî bigirin Înstîtuyê - bi rastî li ser vî esasî gelekî kar dikin. Ew dixwazin di lêkolîn, nîqaş û gotarên xwe de wê heqîqeta civakî ya li Rojava ya piştî şoreşê nîşan bidin.

> ◗ Me fêm kir ku rizgariya ji mêhtingeriyê ne tenê li ser ziman e, ew her wiha li ser cîhanbîniya me, li ser rêbazên têkiliyên me li gel zanist û li gel rastiyên jiyanê ye jî. Meseleya rakirina mêhtingeriyê, li nav gelên xwe cihî ev bi salane, ji mijarên behsa zanistî ne jî.


** Rêveberê Înstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Rojava.*





◗ Di warê zimanî de ev fenomenên nû yên civakî bi têgeh û peyvên "Hevaltî" û "Jin" di çarçoveyekê de tên bicihkirin. Ew jî weke peyv û gotin esas îşaret bi manedariya awayê têkiliyên dostane yên di navbera cinsan de û rolên giştî yên jinan dike.

# Li Rojava di warê zimanî de fenomenên nû yên civakî



Remezan MENDAYÎ

Kurdan û dostên wan 19'ê Tîrmeha bihurî li gelek deverên dinyayê dehsaliya Şoreşa Rojava pîroz kir. Rast e hîna şerê çekdarî bi komên Îslamî re dewam dike. Nexasim şerê YPJ'ê li dijî DAIŞ'ê kete rojeva dinyayê jî. Lê ya ku esas di warê dîrokî de jî manedartir e, ew e ku veguherîna demokratîk-siyasî şoreşa civakî ya li Rojava ye. Ji deh salan ve, miletên Rojavayê Kurdistanê, û Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe li ser bingehê hizra Konfederalîzma Demokratîk a Abdullah Ocalan xwe bi rê ve dibin. Xwerêveberiya gund, kolan, tax, bajar û herêman di çarçoveya avahiyên siyasî yên komunal û li gorî demokrasiya li cihêcih, bi cih tê anîn. Bi dehhezaran mirov û nexasim jî beşdarî vê rêveberiyê dibin, teşe didinê û barê wê hildigirin. Ev xwerêveberî di warên civakî yên weke perwerde, ewlehiya hundirîn, xizmeta tenduristiyê, çand û huner, hiqûq, siyaset û çapemeniyê. Avahiya siyasî ya van warên civakî yên giştî xwe disipêre bingehê normatîf ê Peymana Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûrî.

Heta wê kêliya guherîna şoreşgerî ya 19'ê Tîrmeha 2012'an, ev warên civakî yên li jor me navê wan bir, bi awayekî navendî, ji jor ber bi jêr ve bi destê dewleta netewe ya Sûrî, esas desthilata wê ya yekpartiyê ya rejîma Esed dihatin kontrolkirin. Îro roj siyaset û xwerêveberiya li Rojava, esas bi hikûmeteke gel a nenavendî û demokratîk çêdibe.

Di nava dewleta Sûrî de mîrov û nexasim jî Kurd, esas ji rêveberî û siyasetê hatibûn dûrkirin. Çawa beramberî civakê hemûyî peywendiya dewleta netewe ya navendî ji jor ber bi jêr ve bû û hiyerarşîk a newekhev e, wisa jî peywendiya dewleta netewe beramberî mirovan ji jor ber bi jêr ve û hiyerarşîk a newekhev e: Qanûnên wê û zora (tundiya) wê beşên berfereh ên jiyanê diyar dikin. Weke berevajiyê wê, ji şoreşê û vir ve, tişta ku civakî û giştî ye û tişta ku siyaset e, bi rêya tevnên mirovan ên li komunan, di navbera komunan de û temamê sazî û dezgehên din ên xwerêveberiyê bi awayekî yekser demokratîk û dînamîk tên birêkûpêkkirin. Mirov gava berê xwe dide vê pêvajoya veguherînê û lê hayil dibe, hingê mirov tesbît dike ku pêvajo û peywendiyên van deh salên dawî yên bi li Rojava, guhertin û nûkeriyên bigehîn in. Ji ber van xisletên xwe yên sereke, şoreş tesîrê dike li mijarên mezin û yekeyên mezin ên weke dewlet, desthilat, civak û pirsa civakîbûnê bi giştî jî.

Di warê civakî de gava ku mirov li meseleyê binihêre, li aliyekî guhertineke bingehîn a jiyanê bi rê ve diçe û li aliyê din jî guhertineke esasê civakî li dar e. Esas, di heman demê de gelek pêvajoyên dîrokî bi rê ve diçin, û li ser her pêvajoyê divê yan jî diviyabû gelek lêkolîn û xebatên cuvaknasiyê û yên din ên zanistî bihatana birêvebirin û kitêb li ser wan bihatana nivîsandin. Û bi rastî jî menzîla Şoreşa Rojava ne tenê bi mirov û komên piştgirê wê re sînor dar e, ew di warê zanistê de her roja dibihure bêhtir xwe di bîreweriyê de dide der. Em lazim e bi hewas û kelecan li bendê bin ka projeya Rojava wê hîna çi destketiyan bi xwe re bîne û ev ê çawa tesîra xwe li temamê Rojhilata Navîn bike û tîna xwe ji wê û wêde jî bide.

### Tesîra dualî ya Şoreşê û avahiyên civakî

Pirsa sereke li vir ya ku ez ê pê dakevim, lêkolîna min a civaknasiyê ya li ser Rojava ye, û ew jî rewşa nû ya civakî, nexasim jî rêxistinên li zemînê û her wiha fikr û nirxên Konfederalîzma Demokratîk, çawa tesîrê li mirovan û jiyana wan a rojane dikin û ka ev tesîrên hanê çawa di ser kirin û pratîkên jiyana rojane ya mirovan re tesîrê li avahiyên (strukturên) civakî dikin. Ev pirseke pirr tevlihev a civaknasiyê ye, ji ber ku gelek alî û warên tişta civakî yên weke rêûresm, aborî, jiyana rojane, têkiliyên di navbera cinsan de exlaq, ziman, dem û dezgeh, pîvanên kevin û yên ku halê hazir diguherin, dîrok û roja îro, û gelek mijarên din divê werin lêkolan, û her wiha lazim e bitûnê wê di çerxa parçeyên wê de bi rêbazên zanistî were şirovekirin.

Ji bo çarçoveya vê gotarê ez dixwazim berê xwe bidim nimûneya mirovên di komunan de çalak û bi rêya wan raxînim ber çavan ka çawa li vir "guhertineke esasî" di têkiliyên di navbera cinsan de di jiyana rojane de darîçav bûye.

### Têkiliyên ji rêûresmê yên cinsan li Kurdistanê

Herçî civaka ji rêûresmê ya Kurd e, nisbet bi têkiliyên cinsan ên giştî û dabeşkirina rolan a li gorî cinsan de xwedî strukturên exlaqî yên welê ye yên ku dişibin civakên din ên li Rojhilata Navîn. Xisleteke esasî ya vê struktura exlaqî ew mane û rola jinê û bedena jinê ye, ya ku bi têgeh û saziya civakî "namûs"ê tê terîfkirin. Herçî kompleksa namûsê ye, ew jî bi wayekî dîrokî bi rêye dîn û manebarkirinên baviksalar hatiye rewakirin. Xisleteke vê fenomena civakî ya diyarker ew e ku namûsa mêr û tevahiya malbatê yan jî eşîrê esas bi bi jinê û bedena wê ve tê girêdan. Çavkanî û dîroka vê qewimînê hîna nayên zanîn, tevî ku gelek tişt îşaret dikin bi beridîna wê ya paralelî şaristaniya baviksalar a dewletdar. Xwedanader û encamên wê yên daimî di nava civakê de dikarin heta roja me ya îro jî bên dîtin. Ez dixwazim li vir behsa du encamên darîçav ên civakî bikim ên ku yekeya exlaqî namûsê kiriye ew teşe bigirin û avahiya wan diyar kiriye. Yek jê têkiliyên cinsan ên ji derveyî mekanê malbatê ye, yan din jî dabeşkirina rolan li gorî cinsan di warê şexsî yên nava malê û di warê giştî yê derveyê malê de. Her du fenomenên civakî yên ku elaqeya wan bi hev re heye, mirov dikare kurt û Kurmancî wiha terîf bike: Jin berpirsiyar e ji karên nava malê û mezinkirina zarokan, li aliyê din her çî meydan û mekanê giştî ye, ew yê mêran e. Ji ber namûsê azadiya wan a tevgerê bi awayekî şidayî bi malê hatiye sînordarkirin. Ji vê û wê de, têkiliyên cinsan ji ber namûsê bi awayekî mubalexekirî hatine terîfkirin, bi vî awayî destûra jinan nebû ku têkiliyên civakî bi zilamên li derveyî malbatê re - yanî bav, bira, hevjîn, kur, tî û wekî din - deynin. Helwêsteke bi namûs, peywendiyên necinsî bi zilamên "xerîb" re qedexe dike. Encama pêvajoyî û xwe bi rêya rêûresman di nava civakê de bicihkirî ya vê avahiya civakî ew bû ku jin û jiyana wê ya rojane di nava malê de bê asêkirin, jiyana wê ya rojane bi malbatê sînordar bû û malxê malê yê mêr li gorî baviksalariyê li ser wê serwer bû.

### Şoreşa Jinê li Rojava

Di Şoreşa Rojava de bi avakirina sazî û dezgehên li zemînê civakî demokratîk yên weke komun, komîsyon, meclîs yan jî bipêşxistina warên weke perwerde, ewlehiya hundirîn yan jî zanist û ragihandinê, kir ku "zincîrên jinan bên qetandin" û kir ku ew ji mekanê nava malê û ji rolên ji rêûresmê karibe derkeve. Jin jin hingê ve tevahiya warên civakî diyar dikin û di navê de rol û fonksiyonên cihê digirin, yên ku heta hingê bi awayekî ji rêûresmê yên mêran bûn.

Lê belê çawa dibû ku fenomena namûsê û reûresmên pê re elaqedar di warê têkiliyên cinsan de li paş bên hiştin, eynî weke ku hîç berê nebin? Ji bo vê em ê berê xwe bidin pirsa, ka gelo rabihuriyeke ku ev guherîn amade kir, berê hebû yan na. Ji bo vê jî ez ê her li meydana komunan bimînim, da ku bersiva pirsê peyda bikim.

Komun yekeya pêşî û ya bingehîn a temamê sazî û dezgehên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrî ne. Di her komunê de 100 ta 250 malan dikarin hebin. Yek ta çar komunan bi hev re "komîngehekê" parve dikin. Ev komîngeh avahiyeke giştî ye ya ku di dema saetên xebatê de li her kesî vekiriye; dibe ku mirov tenê herê lê çayekê jî vexwe.

Xwerêveberiya cihî ya komunan ji du warên sereke pêk tê: Rêveberî (Îdare: xizmetên sereke û dabeşkirina çavkaniyan) û siyaset (weke nimûne, hiqûq, perwerde yan jî xizmeta tenduristiyê). Aktorên sereke yên rêveberiyê û siyasetê yên komunan hevserok û endamên komîsyonan in. Di vî karî de jin û mêr bi hev re û hevpar kar dikin sebaret bi karûbarên giştî û li komîngehan. Yan jî ew weke hevserokan diçin serdana malên di komuna xwe de. Ev jin û mêr bi hev re ne zewicî ne û - li deverên ji gundekî mezintir - ew pirraniya caran ne xizmên hev in jî. Kurt û Kurmancî ji Şoreşa Rojava ve warê giştî û yê siyasî bi destê jin û mêran bi hev re tê birêvebirin, û ji bo vê jî em dibînin ku rola jinê guheriyê ji mekanê navmalê ber bi mekanê giştî ve. Ew sînordarkirina manewî û mekanî ya tevgeriyanê ya ku bi rêya namûsê li ser hatibû ferzkirin, betal bûye û ew bi hev re û - qet nebe fermî- hevmafê wan mêrên ku bi xizmantiyê nagihîjin wan jî di nava siyasetê û birêvebirina jiyana rojane de ne. Helbet peywendiyên baviksalarî û newekhev di bin perdeyê dewam dikin û rêyeke dirêj hêna heye da ku hevmafiyeke civakî ya temamî were avakirin û misogerkirin. Lê belê li paş xwe hiştina benda namûsê re, êdî rêya ber bi vê yekê re hatiye xweşkirin.



### Rola ziman û têgehan

Di warê zimanî de ev fenomenên nû yên civakî bi têgeh û peyvên "Hevaltî" û "Jin" di çarçoveyekê de tên bicihkirin. Ew jî weke peyv û gotin esas îşaret bi manedariya awayê têkiliyên dostane yên di navbera cinsan de û rolên giştî yên jinan dike. "Hevaltî" weke têgeh peywendiya necinsî, dostane, hevrêtiyê yan jî civakî-siyasî ya di navbera jin û mêran de tarîf dike. "Jin" yan jî "Jina azad" jî ji bo jina nû ya di warê giştî û siyasî de cihê xwe digire.

Di jiyana rojane ya komunan de min di nava 6 mehên ku min li Amûdê bihurandin, çavdêriya wê kir, çawa jin û mêr hevdu weke heval bi nav dikin û têkiliya wan a siyasî jî li dora "hevaltiyê" hatiye hûnandin. Herçî jinên di nava komunan de ne, ew yan tenê "jin" in yan jî "hevalên jin" in. "Jin" esas li vir şûna têgeh û peyvên din ên di zimanê Kurdî de digire yên ku elaqeya wan bi piçûkxistinê yan jî pîskirinê heye; weke nimûne jinik.

Bi awayekî gelekî darîçav ev babeta ez pê dadikevim, veguherîna têkiliyên di navbera cinsan de û rol û maneya jinan, bi van gotinên hevserokekeke komuneke Amûdê xwe îfade dike:

"Rabû îja hevala hingî go de her tu xwe bike serok û virde û wêde û hevalê min jî hat zilamê min qaneh kir, rabû ji me re civîn çêkirin, ez bûm seroka komînê, kêfa min hat yanê."

Wê behsa wê pêvajoyê dikir, ka çawa di nava komunê de cih girtiye bûye hevseroka komunê. Hevjînê wê hatiye qanehkirin, lewma ji ber "urf û adetên berê" serê pêşî ne bi dilê wî bû.

Li vir "heval" hevserokê mêr e. Em bi rehetî tesbît dikin ku têgehên fenomen û peywendiyên nû, xwe berdidin yan jî xwe berdana nav zimanê rojane yê xelkê û

di heman demê de ziman nûyê û veguherînê jî îfade dike. Ev nimûneya kurt, eşkere nîşana wê guherîna esasî û şikestinên elaqedarî pirsa jinê û ya demokrasiyê ye.

### Rabihuriya dîrokî û destpêka şoreşê

Min li jor pirsî bû gelo çi rabihuriya Şoreşa Jinê û Şoreşa Rojava heye ku kiriye ev pêvajo û çerxa wê bigerin. Ji bo pirraniya civaka Kurd bersiva pirsê hêsan e, lewma ji dehê salan ve ew ne tenê şer li wan diqewime û ew li ber xwe didin, lê ew di heman demê de veguherîneke civakî tecrûbe dikin. Û ew ji tesîra şerê çekdarî û wêde diçe. Ew rastiya jinên Kurd û Tevgera Azadiyê nas dikin, û ew rastî bi gelek awayan bandorê li wan dike. Çawa ku ev yek ji bo temamê Kurdistanê lê ye, bi taybetî ji bo Rojava lê ye. Lewma Abdullah Ocalan hê sala 1979'an çûbû Kobanê, Rojavayê Kurdistanê. Wî li wir tevî bi sedan kadroyan karê ajîtasyona siyasî û perwerdeyê di nava Kurdan de dikir. Abdullah Ocalan di salên 1990'î de di analîzên xwe yên navdar de bi awayekî xurt serê xwe êşand bi "Jin û malbatê li Kurdistanê". Wî di van analîzên xwe de bi awayekî rexneyî nexasim malbata ji rêûresmê û mijara namûsê danî ber xwe û bi wan daket. Yek ji serketinên Abdullah Ocalan ew bû ku wî di van pêdaketinên xwe de wî karîbû maneya "jiyaneke bi şeref/binamûs" hem ji bo mêran û hem jî jin bo jinan ji bedena jinê qut bike û bixe nava warê siyasetê.


Ji bilî vê gelek Kurdên ji Rojavayê Kurdistanê di nava şêrê azadiya Kurdistanê de cihê xwe girtin. Maneya vê di heman demê de ew bû ku nirx û çanda Tevgera Azadiyê li Rojava di nava xelkê de sînerjîk û bi girêdaneke hissî û exlaqî berbelav bibe. Em bêguman dikarin bibêjin ku tovên destpêkê yên Şoreşa Jinê divê serdema civakî û ronakbîrî a berxwedanê de hatina reşandin.

Em lazim e beriya vê gotarê bi dawî bikin, berê xwe bidin çiyayên Kurdistanê jî û binihêrin li pêvajoyên li wir bi rê ve çûyî, têgehên li wir nû avabûyî yan jî maneyên nû li wan hatin barkirin. Lewma ev yek dike ku em peywenda dîrokî ya têkiliyên di navbera Tevgera Azadiyê û Şoreşa Rojava de eşkere bibînin. Veguherîna di têkiliyên di navbera cinsan de, maneyên nû yên li mêrbûn û jinbûnê hatine bar kirin, birêxistinkirina xweser a jinan û tecrûbeyên nû yên bi peyv û têgehên 'Jin', 'Jina azad', 'hevaltî' yan jî 'heval' encamên pêvajoyên civakî ne, yên ku pêşî li çiyayên Kurdistanê hatin bipêşxistin û ji wan çiyayan wan xwe ji çemekî dîrokî berda gelî, newal û deştên Kurdistanê.



Lêkolîneke bi awirê ne ji bazarê li ser kooperatîfvaniya li Rojava

# Birêxistinkirina têkiliyeke civakî



Azîze ASLAN

Tevgera Azadiyê ji roja xwe ya pêşî ve bîra wê biribû û zanîbû, ji bo avakirina şoreşeke civakî têkiliyên aborî yên ne kapîtalîst hewce ne. Bi vî rengî wê siyaseta xwe bi rê ve bir û di Xweseriya Demokratîk de wê ev yek weke aboriya birêxistinbûna aboriya civakî ya komunal demokratîk bi nav kiriye. Ev aboriya antîkapîtalîst li ser hîm û prensîpên demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê tê terîfkirin. Armanca sereke ya vê aboriyê ew e ku bi rêya kooperatîfan, hilberînê civakî bike, pêdiviyên kolektîf û nirxê bikaranînê ji nû ve bike armanca tenê ya çalakiya aborî. Bi Şoreşa Rojava û Xweseriya Demokratîk re li gorî vê armancê xebatên Aboriya Civakî û aboriya xweser a jinê AborîyaJIN tên birêvebirin.

Di salên destpêkê yên şoreşê de ji ber şerî, awir û enerjî hemû li ser wê yekê bûn, ka meclîslên li taxan wê çawa pêdiviyên civakî bên dabînkirin. Lê ji sala 2014'an ve erdên ji rejîma Sûrî mane, bi armanca avakirina "Aboriya Civakî" hatine komunalkirin, yanî erd yên her kesî ne lê ne milkê ti kesî ne jî; Aboriya civakî ya antîkapîtalîst tê avakirin ya ku pê xelk pêdiviyên xwe bi rêya têraxwekirinê dikare hilberîne, û nirxên bikaranînê yên ji bo debarê tên hilberandin. Pratîka xweseriyê her ku bi temamî xurt dibe, şaxên xwe berdide nava civakê, şert û mercên maddî yên têkoşîna li dijî kapîtalîzmê, û bi tecrûbeya Tevgera Azadiyê xweparastina civakî jî xurt dibe.

Birêxistinkirina warên weke aboriya civakî, çandinî, pîşesazî, bazirganî û aboriya jinê bi beşdariya TEV-DEM (bi rêya komîtaya giştî ya aboriyê), Kongra-Star (bi rêya komîteya aboriyê ya jinê), desteya aboriyê ya hikûmeta xweseriyê û hevberdevkên aboriyê yên meclîsên kantonan, ji hêla Koordînasyona Aboriyê ve tê birêvebirin.

Koordînasyon li gorî sektoran xwe weke komîte bi rêxistin dike. Armanca çalakiya wê ew e ku di sektora xwe de birêxsitinbûna aboriya civakî berfereh bike û di wê sektorê de hilberînê komunal bike. Ji bo sektoran hemûyan hedefa hevbeş bipêşvebirina kooperatîfvaniyê ye. Li Rojava, yek ji mijarên herî zêde li ser minaqeşeyên himhimî tên kirin, ew e ka kooperatîfvanî wê çawa bê avakirin û ew ê çawa bixebite. Hema hema di tevahiya civînên gel de ev mijar dibe beşek ji rojevê, mirov bi wê mijarê dadikevin. Demeke dirêj li ser mijarê nîqaş tên kirin; hizir tên îfadekirin û kooperatîf weke proje tên sêwirandin. Ji bo kooperatîfên weke proje hatine sêwirandin, xelk bi xwe çavkaniyan berhev dike, rê, rêbazan û meydanan diafirîne ji bo ku pêdiviyên civakî bi awayekî kolektîf bên dabînkirin.

### Mal û Komîteyên Kooperatîfan

Di çarçoveya tevgera kooperatîfvaniyê ya komîteya kooperatîfan de ji bo berbelavkirina kooperatîfvaniyê, ji bo çareserkirina hevpar a pirsgirêkên kooperatîfan, hevpar dabînkirina pêdiviyên wan li her deverê Mala Kooperatîfan, di asta kanton û herêman de jî Yekîtiya Kooperatîfan (bi kurtî jê re Yekîtî tê gotin) hene. Ev ji wan saziyan in ku di çarçoveya pêdiviyên tevgera kooperatîfvaniyê de derketine holê (weke gelek saziyên din ên Xweseriyê). Gava mirov li avahî û xebitîna wan binihêre, mirov têdigihîje ku ew saziyên têra xwe xweser in.

Ji Yekîtiyê re çiqasî bibêjin, Yekîtiya Kooperatîfan jî, esas ew weke yekîtiyek û meclîseke Malên Kooperatîfan dixebite. Mala Kooperatîfan di pêvajoya damezrandina kooperatîfan de şêwirmendiyê ji wan re dike. Herçî Yekîtî ye, ew ji bo peydakirina qismekî ji fînansmana kooperatîfê berpirsiyar e. Pirraniya fînansmanê bi destê komunên tevlî nava wê kooperatîfê dibin, tê peyda kirin. Li aliyê din, bi awayekî berbelav kooperatîf li astên navçe, kanton û herêm de birêxistin dibin. Plansaziya wan a li gorî sektorên wan ên kar, bi awayekî hevpar ji aliyê Malên Kooperatîfan û Yekîtiyên Kooperatîfan ve tê kirin. Bi vî awayî, ew li gorî prensîpa ku sektor hev du temam bikin, tevdigerin. Wekî din di civînên meclîsan ên bi beşdariya berdevkên kooperatîfan û pişt van meclîsan bi beşdariya tevahiya berdevkên Malên Kooperatîfan civîna meclîsa Yekîtiya Kooperatîfan tê kirin. Ev çerx û civîn ji bo kooperatîfan mekanê jihevhînbûnê û hilberandina çareseriyên hevpar e.

Di dema van civînên meclîsan de rapor tên pêşkêşkirin, û ev raporên hanê di pêvajoya kooperatîfbûnê de weke rêbazeke formasyona kolektîf kar dikin û di heman demê de pêşiyê li wê yekê digirin ku di navbera saziyan de têkiliyên hiyerarşîk, yên jêr û jor bên avakirin. Jixwe, ev yek jî dike ku têkiliyên civakî yên li dora vê aboriyê ava bûne li ser zemînê demokratîk çalak bin. Sermeselê, wezîfeyên Malên Kooperatîfan tenê wezîfeyên weke koordînekirina dema damezrandina kooperatîfan û destekkirina pêvajoyên hilberandinê ne. Lê gava ku ew xwe li ser kooperatîfan bibînin û hewl bidin li ser navê kooperatîfan biryarê bidin, yan jî danûstandin ne zelal û şefaf be, ev rewş hingê bi rehetî di beşên rexneyê yên raporên kooperatîfan de tên ziman.

### Kooperatîf li Rojava têkiliya komunalbûnê ne

Yek ji xisletên ku kooperatîfvaniya li Rojava xweser dike, ew e ku xwerêveberî ne tenê ya endamên kooperatîfan e, lê her wiha ya komunan e jî. Kooperatîfên ku biryara komunan û li gorî pêdiviyên wan hatine damezrandin, piştre jî ser bi xwerêveberiya komunan in. Ev yek jî esas di pratîkê de pêkhatina tesbîteke Tevgera Kurd e. Tevgera Kurd li ser meseleya xwerêveberiyê yan jî rêveberiya xweser tesbît kiriye ku nabe ku xwerêveberî ya çîneke be lazim e ew ya civakê be jî. Lewma, Tevgera Kurd dibêje, tenê wisa têkiliya di navbera aborî û pêdiviyê de wê ji hev qut nebe. Komîteya Kooperatîfan yan jî Mala Kooperatîfan civînan bi komunan re li dar dixe. Di van civînana de ew minaqeşe dikin ka pêdiviyên komunan ên hevpar çi ne, derfetên wan ên aborî çi ne û ka dixwazin çawa hilberînin. Paşê ji weke modelekê yan jî teşeyekî kooperatîfan pêşniyaz dike. Heger komun biryarê bide kooperatîfê damezirîne, hingê Mala Kooperatîfan/Komîteya Kooperatîfan, piştiriya pêwîst dide wê komunê. Ev piştgirî dikare bi rengê dabînkirina erda ji bo hilberinê be, ev erd ji wan erdên hatine komunalkirin tê peyda kirin. Destek dikare bi rengê peydakirina amûrên hilberandinê be jî. Ji bili van her du awayên piştgiriyê yên ku ji bo hilberandinê hewce ne, desteka rêzek formasyon û avakirinên sosyo-polîtîk jî heye li ser mijarên

> ◗ Wexta ku kooperatîf bi civakê re têkiliya xwe datînin, vê yekê li ser esasê hilberandina pêdiviyên kolektîf bikin, hingê kooperatîf wê êdî ne tenê yekeyên hilberandinê bin, ev yek wê kooperatîfvaniyê veguherîne peywendiyeke civakî. Aboriya civakî jî esas birêxistinkirina vê bi xwe ye.

weke, avakirina têkiliyên kooperatîfan, demokratîkbûna wan, avakirina rêveberiyên kooperatîfan, pê re xurtkirina kapasîteya xwerêveberiyê, birêkûpêkkirina têkiliyên di navbera cinsan de.

Li aliyê din Malên Kooperatîfan serê du salan carekê ji komunan dixwaze ku ew endamên kooperatîfan diyar bikin ji bo wan kooperatîfên ku li ser erdên hevpar tên ava kirin. Komun jî bi awayekî bi dorê be (usûla rotasyonê) hin endamên xwe diyar dike û wan weke endamên kooperatîfan pêşniyaz dike. Gava ku em nexasim li wan kooperatîfan dinihêrin, ên ku li ser erdên komunal li ser bingehê maf û nirxê bikaranînê hatine avakirin, em dibînin ku li Rojava kooperatîf ne mekanên hilberandina sazûmankirî ne lê ew bêhtir têkiliya komunalbûnê ne.

### Şikandina serweriya nirxê bihevguherînê heyatî ye

Kooperatîfên ku têkiliyên wan ên civakî ne xurt in, ji bo pêdiviyên civakê yekser hilnaberînin, heman meseleya wan û pirsgirêka wan çêdibe: Lêgerîna bazarê-firotin. Ji ber ku kooperatîfên bi civakê re têkiliya wan heye, xwediyê wê derfetê ne ku li ser esasê nirxê bikaranînê hilberînin. Û pê re jî ew berhemên xwe di berdêla pereyan de bifiroşin jî yanî nirxekî bihevguherînê hebe jî ev nirxê bihevguherînê ne di wê astê de ye ku li ser çalakiyên kolektîf ên kooperatîfê serwer be, wan domîne bike. Lê belê kooperatîfeke ku yekser têkiliya wê bi civakê re nîne, ji bo pêdiviyeke yan jî nirxekî bikaranînê yê




hevpar hatiye diyarkirin, berheman hilnaberîne, xwe bisipêre kar û xebata kolektîf jî wê kêliya ku neçar bimîne berhema wê hilberandiye di şert û mercên bazara (piyaseya) kapîtalîst bifiroşe, nirxê bihevguherînê li ser wê serwer dibe. Ji ber vê yekê peywendiya li Rojava di navbera kooperatîf û komunan de hatiye danîn, heyatî ye di warê avakirina hêzeke antîkapîtalîst û avakirina aboriyeke welê de ya ku xwe disipêre nirxê bikaranînê. Ev peywendî dikarin bi du awayan bin. Dibe ku serê pêşî civak hebe û kooperatîfa wê civakê ji bo pêdiviyên xwe ava kiriye paşê çêbe (ji komunê ber bi kooperatîfê ve). Lê ew dikare her wiha serê pêşî kooperatîfek be ya ku ji civakê xweser hatiye avakirin û paşê ji bo ku xwe ji serweriya nirxê bihevguherînê rizgar bike civaka xwe jî ava kiribe (ji kooperatîfê ber bi komunê ve). Wexta ku kooperatîf bi civakê re têkiliya xwe datînin, vê yekê li ser esasê hilberandina pêdiviyên kolektîf bikin, hingê kooperatîf wê êdî ne tenê yekeyên hilberandinê bin, ev yek wê kooperatîfvaniyê veguherîne peywendiyeke civakî. Aboriya civakî jî esas birêxistinkirina vê bi xwe ye.





Ew ê li milê rastê yê pêşî Xelîl Huseyin e

# Lêkolînên Zanîngeha Rojava jiyana wî guherandin

Xelîl Huseyin ji xwendekarên Beşê Zanistên Civakî ya Zanîngeha Rojava ya li Qamişloyê ye û di heman demê de ji mamosteyên beşê ye jî. Wî li Zanîngeha Şamê li Koleja Felsefeyê xwendiye û tecrûbeya wî ya weke xwendekar û mamoste dike ku ew karibe nexasim jî xwendina zanistên civakî û lêkolînên heman beşê li ber hev bigire. Ew yek ji xwendekarên mastirê yê çalak bû di hevkariya Zanîngeha Rojava û Zanîngeha Bremenê de. Di hevkariya vê havînê ya li ser mijara rizgarkirina ji mêhtingeriyê yan jî dekolonîzasyonê de ew jî tevî 9 xwendekarên din ên beşê bi minaqeşeyên xwe li awirekî nû yê lêkolînên li ser dekolonîzasyonê tevî xwendekarên Zanîngeha Bremenê geriya. Em li ser cihêtiya zanistên civakî li Zanîngeha Rojava bi wî re peyivîn. Bi ya wî, cihêtiyên esasî elaqedarî armancên lêkolînên zanistên civakî û birêxistinkirina lêkolîn û dersan li zanîngehê ne: Lêkolîn ji bo xizmeta civakê tên kirin û ne ji bo berjewendiyên madî yên şirket, ferdên din yan jî lêkoleran tên kirin; li şûna têkiliyên hiyerarşîk ên mamoste û xwendekaran têkiliyên hevaltiyê tên danîn.



Luqman GULDIVÊ

***Em bi meseleya lêkolînê dakevin pêşî. Ji ber ku di Dibistana Havînê ya hevpar bi Zanîngeha Bremenê de, me nimûneyên lêkolînên xwendekarên Înstîtuya we jî dîtin. Derfetên we yên lêkolînê çi ne?***

Derfetên lêkolînê hem li ber xwendekaran û hem jî li ber mamosteyan vekirî ne. Lê şertekî sereke heye, ew jî ew e ku divê mijara lêkolînê girêdayî civaka me be. Yanî em li pirsgirêkên civakê dikolin bi armanca geriyana li çareseriya van pirsgirêkan. Derfetên madî jî li ber me vekirî ne. Yanî hem alavan peyda dike û hem jî çûnûhatinê mumkin dike, heger lazim be. Lê awayê kirina xebatê, bêhtir xweber e. Yanî her xwendekar û mamoste bi xwe bi pirranî çûnûhatinê xwe eyar dike û xwe dide ber mesrefên wan ji bo xatirê ku lêkolîna xwe bibe serî, bi encam bike.

> Lêkolînên di modernîteya kapîtalîst de jixwe dikevin xizmeta şirketan. Yanî dikarin civakeke berfireh bixin ber lêkolînê, ji bo xatirê ku zanibin, ka berhemeke dixwazin hilberînin wê bê firotin yan ya. Ev şiklê lêkolînan li Zanîngeha Rojava nîne. Ji ber ku ya sereke li cem me di warê helwêsta beramberî lêkolînê de ew e ku em li pirsgirêkên civakî bikolin û li çareseriya wan bigerin.

Lê her tim zanîngeh destekê dide lêkolînan, û zanîngeha ji bo vê yekê tiştên lazim peyda dike. Jixwe li Zanîngeha Rojava cihgirek heye ku bi vê meseleya karê akademîk û lêkolînan dadikeve. Lê em nikarin bibêjin di warê lêkolînê de em li Zanîngeha Rojava gelekî xurt bûne. Lewma jixwe projeya hatiye pêşkêşkirin jî wê bi destê xwendekarên nû bê avakirin. Lewma jî di warê zanistên civakî de, zanîngeh bêhtir guhdarî xwendekaran e û derfetan ji wan re peyda dike. Heger ew xwendekar di warê lêkolînê de serketî bin, ew ê li Zanîngeha Rojava bibin pêşeng di warê lêkolînên li Zanîngeha Rojava de.

***Lêkolîna li Rojava bi çiyê xwe guhertiye? Mijar, rêbaz, helwêstên beramberî zanistê yan tiştekî din?***

Herçî rêbaz e, em nikarin behsa guhertinên sereke bikin ji ber ku em behsa rêbazên zanistî dikin. Lê mesele mirov çawa radihêje rêbazan û miamele bi wan re dike. Ferq jî di encamê bi xwe de ye. Sermeselê, gava em lêkolînê dikin, aliyê sereke, aliyê exlaqî ye. Lêkolîn ji bo xatirê peydakirina çareseriyekê ji bo pirsgirêkeke civakî tê kirin, ne ji bo xatirê sûd û berjewendiyên madî. Em di lêkolînên li welatên rojavayî yên modernîteya kapîtalîst de dibînin ku ew gava bi rêbazên postkolonyal bi mijarên ciknasiyê dadikeve, ew lê dinihêre ka dikare çawa bi xwe jê sûdê wergire. Yanî mesele dibe xizmeta zêdekirina pere û ya şirketan e. Yanî tiştên heyî jî bi rengê şirketê xuya dikin. Ev lêkolîn jixwe dikevin xizmeta wan şirketan. Yanî dikarin civakeke berfireh bixin ber lêkolînê, ji bo xatirê ku zanibin, ka berhemeke dixwazin hilberînin wê bê firotin yan ya. Ka ew ê çi qas pereyan jê kar bikin mitaleya wan e. Ev şiklê lêkolînan li Zanîngeha Rojava nîne. Ji ber ku ya sereke li cem me di warê helwêsta beramberî lêkolînê de ew e ku em li pirsgirêkên civakî bikolin û li çareseriya wan bigerin. Heger çareserî nebe jî, em rohnî dikin da iku ew pirsgirêk zelal be, darî çava be. da ku hinên din karibin çareser bikin.

***Li Zanîngeha Rojava hewldana cihbicihkirina têkiliyên nû yên di navbera xwendekar û mamosteyan de hene, ku dixwazin di lêkolînê de jî têkiliyên hiyerarşîk ji holê rakin. Di pratîkê de ev gelo dibe heger dibe, çawa dibe?***

Ez dixwazim weke mamoste bersiva vê pirsê bidim. Ji ber ku ez ji 2016´an ve mamostetiyê jî dikim li Zanîngeha Rojava dikim. Nakokiyeke sereqet heye. Nakokî jî meseleya analîzkirina daneyan e. Her kes bi çavê xwe lê dinihêre. Lê gava ez rola xwe weke pêşeng bibînin, û xwendekarek pêşniyaza rêyan bike, em ê çawa meseleyê çareser bikin. Ev hatiye serê gelek mamosteyên Zanîngeha rojava. Heger me li hev nekir, em çend rêyan pêşniyaz dikin, yên ku em dibêjin, em texmîn dikin bi van rêyan hûn dikarin bigihîjin hin encaman. Hinga xwendekar li ser ya xwe dimîne û bibêje, na ez dixwazin daneyan halo kom bikin, bi rêya xwe analîz bikim. Em dibêjin, belkî tu pê bixetimê. Lê ew gava li ser ya xwe ye, ew bi ya xwe dike û heger xetimî jî dîsa tê cem me. Gava li ser ya xwe israr dike, weke mamoste tecrûbeyên me bêhtir in, em dibêjin, temam, tu weke xwe bike, lê em bi hev re di têkiliyê de bin. Ka em meyzênin wê çawa çêbe. Lewma, heger rêya lêkolînê li ber xwendekar bixetime, em nehêlin li bin guhê dîwaran bikeve û karibe meseleya daneyan serast bike. Lê pirraniya caran em şiroveyên xwe hal û meseleyê jê re rave dikin û nahêlin ber bi xetimandinê ve biçe. ji bo xat,rê bipêşketina lêkolînan axir bêhtir herdu alî jî li hev dikin.

***Di awa û rêbazên lêkolînên zanistên civakî yên Zanîngeha Rojava de esas çi ye, ya ku wê ji yên din bi temamî cihê dike? Ev dikare elaqedarî çi rêbaz, çi nêzîkbûna li mijar û pirsên lêkolînê be.***

Lêkolînên li Zanîngeha Rojava û yên din bi rastî gelekî ji hev cihê ne. Ez derçûyê Zanîngeha Şamê me. Gava me lêkolîn dikir, sermeselê lêkolîneke li ser aboriya civakî, min tenê dane berhev dikirin ji bo ku fêm bikin ka ev civak çawa bêhtir van tiştên hanê xerc dike yan jî dikirre. Min her wiha dipirsî ka çi sedem hene ku bêhtir filan bêvan berhemê bikirre, xerc bike.Ez bi vî awayî nêzî civaka xwe dibûm. Lê di Zanîngeha Rojava de û bi rêbazên xwenêzîkkirina zanistên civakî, ne tenê rêbazên lêkolînê, lê jiyana min bi xwe jî guherî. Xala sereke çi bû? Berê min lêkolîn timî li bajarên mezin û di nava civakên mezin de dikirin. Lê haya min jê nebû gundê min û derdora min çawa dijî. Weke nimûne, min lêkolînek kir li ser wê yekê, ka çiqas berhemên herêma Çilaxayê yên li ser bîrên avê salane ji genim heye. Min jî destpêkê dane kom kirin: Çend bîrên avê hene, çend tên xebitandin, berhemê her yekê çi qas e,salê wê çi qasî derxin? Bi vê rengê teknîkê min nêzîkî li meselê kir. Lê gava min xwe berda meydana lêkolînê, gava min mijar bi cotkaran re parve dikir, hizr û fikrên nû li cem min peyda dibûn. Ew bi xwe li alternatîfan digeriyan, mesela dipirsîn, em çima bi awayê zibare, yanî palûte najîn. Yekî ji xwediyên bîran digot, ez îro nikarim bîra xwe bişixulînim, va ye xort hene, bila bên em bi şirîkatî bişixulînin. Di dema minaqeşeyan de pirsgirêkên civakî bi giştî hatin nîqaşkirin: Koçberbûna ciwanan, xelkê berê xwe daye karmendiya di nava Rêveberiya Xweser de. Di encamê de ez li ber lêkolînê bi xwe neketim, lê ez pê êşiyam. Mesele êdî ne lêkolîn bû, lê pirsa, ka ev pirsgirêka hanê wê çawa çareser bibe muhim bû. Li vir mentiqê lêkolînê cuda ye. Yanî tu esas lêkolînekê nakî, tu radihîjî barê civaka xwe. Li lewma gelek cudahî hebû, û di wê lêkolînê de jî min hîs kir çiqasî rêbazên min guherîne. erê ez bi awayekî zanistî nêzîk dibim, lê pirsgirên civakê jî li ser milên min bûn. Ka ez li gorî wê me ya na meseleyeke din e, lê wê kir ku rêbazên min ên lêkolînê biguherin. Îro gava em dersan didin jî em dibêjin, mijara mirov bineqîne, divê ya civaka te be. Em dibêjin, heger tu dikarî li pirsgirêkên civaka xwe bikolî û li çareseriyan bigerî, hingê hem tu û hem jî civaka te jî azad dibin.

***Li Rojava meseleya çavkaniyan, ji bo xwe gihandine lêkolînên zanistî ji zehmetiyek e, Zanîngeha Rojava vê çawa sererast dike?***

Bidestxistina çavkaniyan jixwe bi pirsê jî li holê ye. Gelo em dikarin alternatîfan hji bo peydakirina çavkaniyan peyda bikin. Heger nivîskî be, hin camêr û canik ji bo me werdigerînin, mala wan ava be. Ev yek ji rêbazên xwe gihandina çavkaniyan e. Wekî din peywendiyên me bi Zanîngeha Bremen û ya Berlînê re hene. Em û ciwanên wan minaqeşeyan dikin û em civakên hev û xwe jî bêhtir fêm dikin. Bi naskirina civaka wan em bêhtir civaka xwe nas dikin. Çavkaniya me ya esasî li Rojava zemîna me bi xwe ye. Yanî em digerin, em xebata xwe dikin da ku em bigihin netîceyan. Ez weke nimûna behsa Pargînê bikim. Armanca saziya Pargîn ew e ku çand û folklora Kurdî nûjen bike. Yanî dixwaze mêhtingeriya li ser Kurdan rake û bi rêbazeke nûjen û paqij vê bikin. Di lêkolîna min a li ser Pargînê de gelek xisûs dihatin nîqaşkirin. Gava min daneyên xwe yên li meydanê berhev dikirin û jixwe me jî dersên li ser mêhtingerî û rakirina mêhtingeriyê dîtine, êdî li halê xwe pratîk dibû teorî. Vê jî gelek hêz dame ku em pirsgirêk çavkaniyan li paş xwe bihêlin. Lê divê mirov hay ji xwe hebe ji ber ku em teoriyeke herî mezin a cîhanî şirove dikin.

***Azadiya lêkolînê ji bo xwendekar çawa heye, tu dikarî bi tecrûbeya xwe ya Zanîngeha Şamê jî gelo hinekî rave bikî?***

Ez ji Koleja Felsefeyê ya Zanîngeha Şamê sala 2006´an derçûme. Dersdana wan wiha ye, mamoste bi qalibekî tê, dersê dide. Carinan sê pel û carinan heftê pel nivîs bûn. Carinan bê şirove em dişandin ezmûnê. Hiyerarşiyeke darîçav hebû. Min çar salan li Şamê xwend lê min careke tenê jî berpirsê beşê nedît. Xwe gihandina wî meseleyek bû. Di astan hemûyan de hiyerarşiyek xuya dikir. Xwendekar jî her tim di rewşeke pêşbirkê de di rikberiyekê bûn.

Lêkolînên Zanistên Civakî jî li Fakulteya Zanistên Mirovî, kê bixwest di bin vê sîwanê de lêkolînê bike, ew jî rêûresmeke wê ya hişk hebû. Destpêkê erêkirina Doktor yan jî berpirsê beşê lazim bû. Mijarên ku dihatin hilbijartin jî sînordarkirî ne. Di sala yekê de min dixwest li ser cejna Newrozê lêkolînekê bikim. Lê hingê mijar dane ber me, berê me dane hepsa kesên temen piçûk da ku em lêkolînê bikin. Heta bi encama dawî jî ji berê ve diyarkirî bû. Gava me bi doktor re nîqaş dikir, digot, na na vê nekin, bi vî awayî bikin. Yanî tenê me dane kom dikirin û ne ji mafê me bû em wan daneyan analîz bikin. Li ser kêfa wî doktorî dihate hilbijartin.

Lê ku mirov li Zanîngeha Rojava meyzîne, di meseleya dersdayînê de, di her beşêkî de, di her dersekê de her mamoste xwendekar e û di heman demê de mamoste ye jî. Yanî xwe dixe şûna xwendekaran jî. Ji xwendekaran hînî agahiyan dibe. Hem ezmûneke wan a jiyanê heye û hem jî herî kêm deh salan dibistan xwendine. Vê tecrûbe û zanînê, tevî ciwaniya xwe didin mamosteyên xwe. Ji lewma têkiliyeke wiha hatiye avakirin ku mamoste bêhtir bi rola şêwirmend rabe. Bibêje, ev rê baştir e. Di lêkolînan de jî mesele bi heman rengî ye. Xwendekar di mijara diyarkirî de bi xwe lêkolîna xwe hildibijêre.

***Bi qasî min ji minaqeşeyên we yên bi xwendekarên Bremenê re yên havînê karî bişopînm, di meseleya hiyerarşiyê de Zanîngeha Rojava bi giştî û Beşê Zanistên Civakî bi taybet, dixwaze hiyerarşiya rêveberiyê, hiyerarşiya di navbera xwendekar û mamsoteyan de ji holê rake. Di pratîkê de ev çawa dibe?***

Ez di meseleya hiyerarşiyê de dikarim bibêjim, ku ew qalibê hiyerarşiyê ji sedî sed hatiye şikandin. Belkî mamosteyan ji sedî sed ranekiriye, carinan xwendekar jî xwe pirr zana dihesibînin, xwe di astek ji mamosteyan jî bilindtir dibîne. Lê ew qalibê cemidî yê di navbera mamoste û xwendekaran de şikestiye. Têkiliyek derketiye holê û ez dikarim wê bi nav bikim, ew jî hevaltî ye. Di hevaltiyê de tişta baş, agahiya durist, hezjêkirin di wê têkiliyê de lin pêş in. Ez dikarim îro bibêjim, bi navê hevaltiyê em nêzîkî hev bibin. Belkî were pirsîn, gelo hevaltî ji qedrê mamoste weke pêşeng kêm nake. Ez dikarim bibêjim, mesele hemû hiyerarşiya di mejiyan de ye. Heger em karibin hevaltiya rast ava bikin, û bi qedrê her kesî bigirin, bi halê xwe her tişt li cihê xwe bi cih dibe. Dersên me hene li Zanîngeha Rojava li ser vê rêbaza hanê, di meseleya lêkolînê de hevaltî wê çawa be, mirov çawa bi qedrê yê li hember zanibe, mirov çawa lê guhdarî bike. Ev hemû li nava Zanîngeha Rojava tên nîqaşkirin. Ji ber wê jî ez dikarim bibêjim, ji sedî 80 hiyerarşî rabûye û têkiliya li dewsa wê bêhtir mialmeleya hevaltiyê tê meşandin.






# Şopên desthilatdariyê di çîroka Rustem û Sohrab de



Bahadîn AKHAN

Rengê jiyan û jiyara civakî ya Kurdan bi awayekî pirr xwezayî teşe daye çand û kevneşopiya wan. Bi heman awayî çanda Kurdan jî teşe daye jiyana wan a civakî. Dibe ku bê nîqaşkirin, ka kîjan berî kîjanê tê, lê belê qet ne cihê gumanê ye ku meriv bikare bibêje, her du bêyî hev dibin. Çanda devkî ya civakekê, gava ku ji nifşê rabirdûyê bo nifşê dahatûyê tê veguhastin, di xwe de kodên jiyana civakî jî dihewîne. Bi vî awayî jî kodên jiyana civakî yên serdemên dêrîn heta roja me ya îro mane. Ev yek wekî Carl Gustav Jung jî behs dike, amaje bi "binhişiya civakî" dike. Binhişiya takekesî behsa nîşaneyên şexsî yên serveyî/rûbarî dikin, lê di kûrahiya wan da binhişekî kolektif heye û di wê de jî kodên jiyana civakî hene.

Destana Rustemê Zal jî nimûneyeke binhişê takekesî û binhişê civakî dihewîne. Gava meriv ji perspektîfeke şexsî ve lê dinihêre, meriv serhatiyên Rustem nêzî serhatiyên xwe yên şexsî dibîne. Rustem berî ku bibe leheng, şexsek e. Hewldan, arezû û qedera Rustem a lehengtiyê di çarçoveyeke pirr teng de serhatiya takekesîbûna mirovan hemîyan jî dikare destnîşan bike. Ji bo ku şexs bikare hebe, hin bûyer lê diqewimin û tişt tên serê wî. Dibe ku ev rûdan ji bo her kesî rûdanên bi tehlûke nebin, tê de şerekî fizîkî yê rûbirûyî tine be. Jixwe, ferqa Rustemê leheng û Rustemê şexs jî ji vir tê. Lewra, her şexs di jiyanê de şerekî man û nemanê yê li gorî xwe dike. Bi dêwan re, bi cadûgeran re şer nekin û birîndar nebin jî, bi awayekî ji bo hebûna xwe bi hin tiştan re şerekî dikin.

### Hem weke lehengên din e Hem jî yekî weke wî tine

Wekî çîrok, Rustem nîşaneya gelek tiştan e. Rêwîtiya Rustem, ango rêwîtiya leheng ya ber bi çarenûsa xwe ve, di çîrok û dastanên gelek neteweyan de hatiye dubarekirin. Lehengên wekî Rustem gelek in, lê lehengekî wekî Rustem jî hema hema bêje tine ye. Jixwe, ev yek jî ferqekê dixe navbera lehengtiya Rustem û lehengên mayîn. Rustem ku xwediyê Heft Xanê ye, ji gelek aliyan ve ji lehengên din ên cîhanê cuda dibe. Yek ji wan xalên ku Rustem ji lehengên din ên cîhanî cudatir dike jî çîroka Rustem û Sohrab e.

> Ji bo Rustem serhildana Sohrab ya beramberî text têk bibe, text biparêze û wî bikuje, nezanîn û nasnekirin alîkariya wî dikin, bi vî awayî jî kuştina Sohrab tê meşrûkirin. Bav yan jî desthilatdarî ji bo serhildanên li beramberî xwe hemûyan têk bibin, daîma li sedemekê digerin da ku serhildanê têk bibin.

Rustem gava ber bi welatê Semenganê ve dest bi rêwîtiyekê dike û diçe wir, li wir rûdaneke gelek giring tê serê Rustem. Rustem aşiqê Tehmîneyê dibe û şevekê li ba wê dimîne. Ji wê şevê zarokekî wan çêdibe û ew jî Sohrab e. Rustem vedigere diçe welatê xwe û Sohrab jî ji bavê xwe dûr li welatê Tûranê mezin dibe. Efrasiyabê tûranî, Sohrab wekî lehengê xwe dişîne ser welatê Îranê. Sohrab diçe da ku textê Keykawûsê padşahê Îranê birûxîne. Lê esas, armanceke Sohrab a dinê heye. Sohrab dixwaze textê Keykawûs û textê Efrasiyab birûxîne û desthilatdariyê ji wan bistîne bide bavê xwe Rustem û malbata xwe. Lê li vir kesê ku textê Keykawûs diparêze Rustem e. Ji bo trajedî pêk bê, bav û kur hevûdu nas nakin. Her du leheng şer dikin û di axiriya şer da Sohrab bi destê Rustem tê kuştin.

Di çîroka Rustem û Sohrab de meseleya esas desthilatdarî ye. Desthilatdarî wekî têgeh û diyardeyekê hem li Îranê hem jî li Tûranê di deste malbatên diyar de ye. Sohrab dixwaze desthilatdariya her du welatan jî wêran bike û desthilatdariyê bide malbata xwe (Rustem-Zal-Sam) ku bi ya wî, ew heq dikin. Sohrab, esas li hemberî desthilatdariya Îran û Tûranê anarşiyekê temsîl dike. Sohrab dibêje cihê ez û bavê min lê bin kes neşê bibe desthilatdar. Ji ber vê yekê jî Sohrab çend caran behsa dagirkirina Îran û Tûranê dike.

### Mîr Tacîn û Gurgîn

Di çîroknûsiya kurdî ya modern da jî em rastî têkiliya di navbera bav û kur da tên ku gelek emareyên çîroka Rustem û Sohrab dihewîne. Bav wekî nîşaneya desthilatdariyê tim li pêşberî leheng e. Leheng armancekê datîne ber xwe û hewl dide bigihîje armanca xwe. Lê belê bav ji alîkarekî zêdetir wekî astengekê dertê pêşiya leheng. Di çîroka Kamiran Alî Bedirxan a bi navê Eyloyê Pîr de jî em rastî têkiliyeke komplîke ya bav û kur tên.

Di Eyloyê Pîr de jî Mîr Tacîn û kurê wî Gurgîn di çarçoveyeke desthilatdariyê de dikarin bên nirxandin. Mîr Tacîn ji mîrê Kurdistanê ye û Gurgînê kurê wî jî mêrxas û lehengekî ser xwe re ye. Di qesra Mîr Tacîn de bi dehan cariyeyên mîr hene û mîr ji nava wan herî zêde hij ji Perîxana Şingarî dike.

Rojekê Gurgîn li beramberî "Tirko" şerekî dike û bi ser dikeve. Bavê wî jê re dibêje, tu çi dixwazî bibêje. Gurgîn Perîxanê dixwaze, lê mîr neşê vê qebûl bike. Ji ber wê bi hev re biryara kuştina Perîxanê didin. Perîxanê dibin da ku ji kendalekê biavêjin. Di rê de Perîxan diweste û birîndar dibe. Gurgîn dixwaze wê hilgire lê Perîxan xwe davêje hemêza mîr. Gurgîn hingê ji bo vî dîmenî nebîne dibêje bavê xwe, bira ew bidin pêşiyê heke na ew ê ji piştê ve lêde bavê xwe bikuje. Her du Perîxanê dibin ber kendalekê û Mîr êşiyê Perîxanê maçî dike û dû re ji kendal diavêje. Gurgîn li ser vê bûyerê ji bavê xwe re dibêje, em vegerin. Mîr gava dike ku vegere di cî de disekine û dibêje, cîhana ku Perîxan ne lê, ne hewce ye ew jî lê be. Li ser vê, ew jî radibe xwe ji kendal diavêje. Piştî vê yekê Gurgîn tenê ji Xwedê dixwaze ku dilek wisa xurt bide wî jî.

### Çima her du çîrok ne weke hev in

Di navbera çîroka Rustem-Sohrab û çîroka Mîr Tacîn-Gurgîn de ferqeke pirr û pirr mezin heye. Çîroka Rustem û Sohrab li ser esasên tragedyayekê hatiye avakirin. Di wir de bav û kur digel nîşaneyan hemûyan jî hevûdu nas nakin. Ji bo ku trajedî pêk bê, ev lazim e. Esas, şik dikeve dilê Sohrab ku yê pê re şer dike Rustem e. Lê belê Rustem jî digel ku şik di dilê wî de heye li xwe danayne ku ew kurê wî ye. Bi vî awayî trajedî pêk tê. Rustem desthilatdariyê temsîl dike, lê ev ne tenê desthilatdariya bav e. Ew desthilatdariya text temsîl dike. Malbata Rustem tevde desthilatdariya textê Îranê temsîl dike û ew wekî parêzvanên text tim amade ne ku bimirin. Rustem wekî leheng ji şahê Îranê ferman girtiye û tê bi Sohrab re şer dike. Di vir de em têkiliya sêgoşeyî û hiyerarşîk a di navbeyna Xweda-Şah-Leheng de jî dibînin. Sohrab di vir de ne neyarê bavê xwe ye, ew neyarê desthilatdariyê ye. Sohrab nifşê ciwan temsîl dike û dixwaze dahatûyekê ji bo xwe saz bike. Lê belê di vir de astengiya herî xurt a li beramberî wî bav e. Bav di nav mîtolojiyê de gelek caran di çarçoveyeke wiha de hatiye xêzkirin. Ango bav gelek caran ji bo leheng bigihîje çarenûsa xwe, dibe astengiyeke sereke. (Di çîroka Oîdîpus, Kîros da jî meriv dikare qral, mîrên wan welatan di çarçoveyeke bi vî rengî de binirxîne, lê belê di her du çîrokan de jî kehanetek dibe sedemê rûdanê.) Esas, Rustem bi malbata xwe ve parêzvanên textê Îranê ye. Ji ber wê, Rustem dibêje, her kî doza textê Keykawûs bike, çareya wî mirin e û dê her bibe mirin. Ew kur be jî divê li ber text ranebe, hekena ew ê jî bê kuştin. Ji bo têkbirina serhildana Sohrab û kuştina Sohrab, heta radeyekê meşrû bê nîşandan "nezanîn" û "nasnekirin" dibe bingehek. Ango ji bo Rustem serhildana Sohrab ya beramberî text têk bibe, text biparêze û wî bikuje, nezanîn û nasnekirin alîkariya wî dikin, bi vî awayî jî kuştina Sohrab tê meşrûkirin. Bav yan jî desthilatdarî ji bo serhildanên li beramberî xwe hemûyan têk bibin, daîma li sedemekê digerin da ku serhildanê têk bibin û ji bo vê têkbirinê meşrû bikin jî ji xwe re hin rê û rêbazên taybet peyda dikin.

Meseleya meşrûkirinê motîvasyonekê dide çîrokê û meşrûkirin heta radeyekê rê li ber trawmayên civakî digire. Ser meselê, em bêjin Rustem dizane ku yê pê re şer dike Sohrab e û digel vê yekê dîsa radibe kurê xwe ji bo text dikuje. Heke bûyer wiha be, hingê lehengbûna Rustem bi xwe dê tam pêk neyê û heta belkî wekî kesayetekî xerab derbasî nav destan û çîrokan bibe. Ji bo ku leke li lehengiya Rustem nekeve, ev meseleya nezanîn-nasnekirinê tê bikaranîn. Lê esas, her du jî şikê jê dibin ku ew kur û bavê hev in.

Di çîroka Kamiran Alî Bedirxan da, bi awayekî bereks bav dimire (heke em Gurgîn wekî sedem bipejirînin, meriv dikare mirinê wekî kuştin jî bi nav bike). Heke wekî Umberto Eco gotî, ez şiroveyeke bê hed li vê çîroka Eyloyê Pîr bikim, ez dê meseleya hezkirinê jî bi meseleya desthilatdariyê ve girê bidim. Lê em vê çîrokê wiha binirxînin, Gurgîn temsîliyeta nifşê nû û dahatiya Kurdistanê ye. Mîr Tacîn bi kurê xwe serfiraz e û dizane ku kurê wî dê piştî wî welat bi rê ve bibe û ji bo vê yekê jî ti astengiyan jê re çênake. Lê di meseleya hezkirin û desthilatdarbûna bedewiyê de bav ji kur re dibe astengeke mezin. Di vir de Gurgîn jî ji bo bav dibe astengiyek. Lê Gurgîn li ser gotina bavê xwe daxwaza Perîxanê ji bavê xwe dike. Em nizanin ka berî wê Gurgîn dizane bavê wî ji Perîxanê hez dike yan na. Heke bizanibûya hingê Gurgîn dê çav berdaya jinbava xwe. Nivîskar ev yek wisa bi zelalî destnîşan nekiriye. Ji bo Gurgîn ya xwe bi dest bixe kuştina Perîxanê pêşniyaz dike. Lê nizane ku dê bavê xwe jî pê re bikuje. Gelo bizanibûya, wî dê ev daxwaz ji bavê xwe bikira? Di vê çîroka Kamiran Alî Bedirxan de, her sê leheng jî ne xerab in, ew bi awayekî serketî, di nav derûniyeke pirr baş de hatine hûnandin.

### Di nava Kurdan de lawkuştîbûn

Ez vegerim ser çîroka Rustem û Sohrab. Rustem esas her çiqas bibêje, ez kesê ewilî me ku min kurê xwe bi destê xwe kuştiye jî, wî rê li ber kevneşopiyeke wiha vekiriye. Bi ya min piştî Rustem di nav Kurdan de gelek bavan ji bo desthilatdariyê (çi ya wan bi xwe be çi jî ya hinekên din be) biparêzin, lawên xwe kuştine. Erê civak ji trajediyeke bi vî rengî aciz e û derûna wan vê yekê qebûl jî nake, lê belê di nav Kurdan de hema bêje hêzên desthilatdar hemû ji bo kuştina lawên xwe sedemeke rewa peyda dikin û bi vî awayî kuştina wan meşrû dikin. Civak xwe bi vê meşrûkirinê dixapîne. Hekena nikare dewam bike. Ji ber vê yekê îdîaya min a sereke ev e: Civaka Kurd civakeke lawkuştî ye, siyaseta Kurd siyaseteke lawkuştî ye, şoreşa Kurd şoreşeke lawkuştî ye û edebiyata Kurdî jî edebiyateke lawkuştî ye. Çima? Çunkî law/keç siberoja milet û welat temsîl dikin, ti desthilatdar naxwaze li ser siberojeke bêyî xwe bifikire.

Çîroka Rustem û Sohrab trajîk e, lê ya ji wê jî trajîktir êdî ev çîrok bûye kevneşopiyeke civaka Kurd. Ji bo siberojeke aza û baş a civaka Kurd, divê bav bêne kuştin; di wateyeke mecazî de, û ev nayê wê wateyê ku kultur bê binpêkirin, kultur tiştekî zindî ye ku law û keç wê tim diguherînin. Her wiha divê di siyaseta Kurdan de ew kesên ev bi salan in desthilatdar in û hukm li ser hemû beşên civakê û kesên Kurd dikin, bên kuştin, divê di nav malbatê de bav bê kuştin; ev jî di wateyeke mecazî de ye ku Freud şopên vê di berhemên Dostoyevskî de didît. Rustem leheng e û meriv dikare bi kuştina Sohrab di çarçoveyeke neteweperwerî û nijadperestiya Îranê de jî dakeve; jixwe Alîreza Şocaîpûr di vîdeoyeke xwe ya ser Youtubeyê de mesele wiha dinirxand. Lê gava meriv bi çavên Kurdan ve li meselyê dinihêre, aliyê vê yê neteweperweriyê yê ku bê berzkirin tine ye. Tam berovajî wê, Rustem li dijî neteweperwerî û malbatperweriya Sohrab bûye asteng û dijlehengekî ecêb. Ji ber hindê jî li ber çavê min Sohrab ji Rustem lehengtir e. Rustem dibe ku bibe lehengê Îranê û textê keyaniyan, lê Sohrab lehengê siberojê û lawan hemûyan e.



Di Şahnameyê de mînyatura şerê Rustem û Sohrab (1552)

# Arîşe û derfetên Akademiya Kurdî



Lêkolînên Kurdnasiyê yên modern her wekî Martin von Bruinessen destnîşan dike bi çavdêrî û lêkolînên mîsyoner û dîplomatan dest pê kir. Berhema Maurizio Garzoni, Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda, ya di 1787'an de çap bû, wek xebata destpêkê rêya lêkolînên nû vekir. Xebatên Kurdnasiyê li destpêka sedsala 20'an êdî ji çarçoveya teng a lêkolînên îranolojiyê derket û bi xebatên dîplomatên Ingilîz, Fransî û Rûsan berbelav bû. Xebatên rojhilatnasan û koleksiyonên ku li navendên wek Parîs, London, Berlîn û St.Petersburg ketin nav qeydên pirtûkxaneyan, bûn çavkaniyên sereke yên xebatên Kurdnasiyê. Bi demê re lêkolînerên Kurd, û sazî û beşên Kurdî jî daxilî nav serpêhatiya vê meydanê bûn, bi taybetî jî rola înstîtuya rojhilatnasiyê ya Lenîngradê û kesayetên wek Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî, Çerkez Bakaev û yên din hêja ne mirov qala wan bike.

Li roja îro, bi zanîngehên Başûr û Rojava, bi beşên Kurdî yên zanîngehên Bakur û bi gelek saziyên lêkolînê, em dikarin behsa gewdeyeke stûr a xebatên akademîk ên Kurdnasiyê bikin. Ji hêla saziyên perwerdehî û lêkolînan û her wisa ji hêla tekst û berhemên tomarkirî ve, rewşa Kurdan bi awayekî relatîf hem baş û hem jî nebaş e. Dema ku pîvana berawirdkirinê, paşxane û derfetên gelên cîran ên xwedî dewlet û zanîngeh û saziyên dewletên bipêşketî, bi taybetî yên Ewrûpî be, hingê rewşeke nebaş xuya dibe. Lewre, paşxaneya wan gelan û ezmûna wan a sazûmanî xurt e û mîraseke berbiçav hiştine ji bo roja îro, û ekolên navdar ên zanîngehan jî pê re ava kirine. Ji hêla din ve jî, mirov dikare behsa dîrokeke saziyên Kurdan bike û li ber destên me tomargehên teks û berheman, koleksiyonên aîdî serdemên cuda hene ku bi têra gelek lêkolînên cihêreng bikin.



Samî HEZIL

## Statuya Kurdan tesîrê li lêkolînên Kurdnasiyê dike

Di mijareke wiha berfireh de, li gorî qewareya nivîsê, em ê ancax bikarin behsê bînin ser çend xalên sereke. Paşxaneya dîrokî ya akademiya Kurdî û tecrubeyên paşerojê yek ji wan xalan e. Du pirs di vê mijarê de derdikevin pêş: Ezmûnên Kurdan ên rabihuriyê yên weke înstituyên serbixwe, kursî û beşên zanîngehên welatên cihê û saziyên lêkolînê ji bo saziyên îroyîn yên wek zanîngeh, înstîtu û beşên Kurdolojiyê mîraseke çawa hiştin; xebatên arşîvkirî, koleksiyonên berheman, xebatên teknîk û ferhengî û kuliyata ku derket holê ji bo bikaranîna roja îro, çiqas sûdewer û amade ne? Pirsa duyem jî ew e ku tecrubeyên sazûmanî yên rabihuriyê bi çi awayî divê bibin mijarên lêkolînê da ku ji bo bipêşxistina saziyên heyî daneyan berdest bikin? Di lêkolînên siberojê de xuya ye ku bersivên wan pirsan ê bêhtir eşkere bibin.

Yek ji kêşeyên sereke yên li pêş akademiya Kurdî astengiyên fizîkî ye ku bi rewşa Kurdan û statuya wan a siyasî re têkildar e. Ji ber arîşeyên siyasî, pêwîstiyên destûra çûn û hatinê û kêşeyên ewlehiyê lêkoler û xwendekar bi awayekî serbest nikarin miracaetî zanîngehan bikin û derfetên wan saziyan bi kar bînin. Astengiyên bi vî rengî ji hêla întelektuelî ve jî dûrahiya heyî ya navbera Kurdan pesend dike. Di vî warî de hin hewldanên têkildarbûnê hene ku zanîngeh bi bernameyên hevpar û sempozyuman dikin ku têkiliyan geş bikin. Dîsa jî ew înîsiyatîf hêj di asteke nizm de ne, û pêwistî bi plansaziyên berfirehtir heye.

## Pirtûkxane û arşîv heyatî ne

Her wisa, çavkaniyên dijîtal ku derfetan çêdikin ji bo parvekirina berhemên zanîngehan, dikarin bandora astengiyên fizîkî kêmtir bikin. Çanda dijîtal li roja îro her çiqasî li seranserê cîhanê bi pêşketibe jî, ew derfet ji bo xebatên akademîk ên Kurdî hîn jî di asteke baş de nîne. Sîstemeke hevpar a parvekirina çavkanî û daneyan divê ava bibe da ku sînorên lêkolînê berfirehtir bibin. Ji bo pêkanîna wan jî katalogên zengîn ên dijîtal, derfetên wergerê û tîpguheziyê, klavyeyên pirzimanî û arşîvên deng û wêneyan wek pêwîstiyên sereke diyar dibin. Michael Rubin di gotareke xwe de ji bo xebatên Kurdnasiyê ji xebatên teorîk zêdetir giringiya çavkaniyên zimanî û pirtûkxaneyan derdixe pêş. Rubîn balê dibe ser derfetên lawaz ên ku pirtûkxane pêşkêş dikin û sedemên vê yekê jî bi temenê ciwan ê zanîngehên Kurdî û bi kêmasiya tevkariya saziyên siyasî ve girêdide.

Her çiqas Kurd di rojeva cîhanê ya siyasî de zêdetir cih bigirin jî, xebatên zanistî yên derbarê Kurdî û Kurdan ji hêla hejmarê ve kêm in û rastî elaqeyeke mezin jî nehatine. Daneyên ku Michael Rubin derpêş dike vê yekê nîşan dide. Di şeş kovarên akademîk ên navdar de, yên wek The British Journal of Middle Eastern Studies, Middle Eastern Studies, Middle East Policy û yên din, ji salên 1970'yî ta 2015'an 77 gotarên derbarê Kurdan cih girtine. Hejmara wan gotaran ji bo nirxandina baldariya akademiya cîhanê ya li ser mijarên Kurdnasiyê xwedî qîmeteke daneyî ye. Ji hêla din ve jî tercîhên akademisyenên cîhanê yên li ser mijaran, perspektîfên wan û encamên wan gotaran dikare fikreke rexneyî bide akademiya Kurdî û bibe alîkar da ku dîmenekî giştî ya disîplînên di zanîngehên Kurdan de nîşan bide.

Di bîst salên dawî de li zanîngehên Başûr û li beşên ziman û çanda Kurdî yên li Bakur hejmara tez û gotarên zanistî bi awayekî berbiçav zêde bû. Hejmara kovarên hekemî û îmkanên weşandinê jî gihişt asteke bilind. Digel kêşeyên metodolojîk, kalîteya lêkolînê û nirxandina xebatan, di demeke kurt de lîsteyeke dirêj derket holê. Di tezên wan deh salên dawî de ku xwendekarên zanîngehên bakur nivîsîne, ji mijarên teorîk bêhtir, mijarên lêkolînê û bi taybetî jî folklor wek tercîh derdikeve pêş. Her çiqas di demeke kurt de bi hejmareke zêde xebat pêk hatibin jî, pêwîstiya bi zêdetir lêkolînan û berfirehkirina qadên lêkolînê xwe nîşan dide. Wek mînak M. Izady di qada dîroknûsiyê de wek kêmasiya sereke nebûna lêkolînan destnîşan dike. Li gorî Izady di gelek pirtûkxaneyan de derbarê dîroka Kurdan a ji serdema antîkîteyê ta roja îro bi têrê belge û agahî hene, an ku ti kêmasiya keresteyên lêkolînê tine, lê lêkolîn bi xwe kêm in. Bi nihêrîna Izady, tiştê ku pêwîstî pê heye ew e ku Kurd bi xwe dîroka xwe binivîsin û dîroknûsiya Kurdî ji helwêstên alîgir û subjektîf biparêzin.

Di xebatên akademiya Kurdî de pêwîstiya pirzimaniyê jî bi awayekî berbiçav xwe dide kifşê. Ji bo lêkoler û akademisyenên Kurd zanîna zimanên fermî yên dewletên herêmî, zanîna zimanên wek Ingilîzî û Fransî, û hem jî zanîna bi zaravayên Kurdî hewcedariyeke esasî ye. Ev rewş her çiqas ji bo akademiya Kurdî wek bargiranî xuya bike jî, ji aliyekî din ve jî xwedî bandorên erênî ye. Ev yek hem asta zimanî û çandî ya akademiya Kurdî bilind dike û hem jî îmkanên zêdetir ên çavkaniyan û cihêrengiya mijaran dide akademîsyenan, û di heman demê de jî qadên lêkolînê berfirehtir dike. Bê guman rîskên xwe sipartina bi zimanên biyanî jî heye, lewre lêkoler û akademisyenên Kurd ji ber kêmiya bîblîoteka Kurdî referansên xwe zêdetir ji zimanên biyanî werdigirin û ev jî xetera bandoreke yekalî derdixîne holê. Wek mînak di nîqaşên lîngustîk de, zimanzanên Kurd li gorî zimanên ku ji xwe re pîvan digirin –zimanê(n) ku ew pê dizanin– hewl didin qaydeyên zimanî yên standart kifş bikin, û di encama vê helwestê de jî referansên cihê yên li gorî zimanên cihê û tercîhên cihê dibin bayîsê rewşeke tevlihev.

Akademiya Kurdî, her ku pişta xwe daye xebatên du sed salên dawî û li ser bingehê sazî û dezgehên lêkolînê û beşên Kurdî yên ewilî ava bûye, di qonaxeke giring re derbas dibe. Îro hebûna zanîngeh û beşên Kurdî hêviyekê dide mamoste, xwîner û lêkolerên qada Kurdnasiyê. Lê gelo ev hêvî dê bi çi awayî bibe bingehê xebatên rasyonel, û kêşeyên heyî yên giring, ku li jorê me bi awayekî giştî çend ji wan destnîşan kirin, dê bi çi awayî çareser bin? Ev pirs tev dê di rojeva akademiya Kurdî ya salên pêş de cih bigirin.

# Bûka Raperînê ye Silava

Ronî RIHA



Li derve şevek reş, vizeviza bayekî kur, li hundur lobîna dayika min a dengbêj bilind dibû. Çîrok û dûrika Edûla bêmirad û Derwêş ê dilsozê gelê xwe, bi dengê wê yê rengxem re li derdorê belav dibû. Dil bûbû hibr, ziman jî bûbû qelem. Deng reh, reh jî can dida gotinê. Gotinên ji bo çîroka sed salan hevdu dihûnan û ji zarê dayika min dipekiyan, zîz dibûn û li dîwarê kevirî diketin. Kevirê kerr û lal ji dîroka bi êş û elem re bûbûn rûpel. Destana gelekî ya bi êş, xêz bi xêz li ser kevirên sar dihat nivisandin. Em zarokên li pêşberî yeksûga dayika min civiyabûn di navbera kêlî û dîrokê da dijiyan. Xeyalek xeybanî xwe li derdorê pêçabû. Gotin bûbû peyamber rasteqîn û nerasteqîn li ser bextê gotinê mabû êdî. Gotin, ne hew bûbû buhur di navbera îro û doh de, heman demê bûbû xaçerêkek bi xem ji bo guhdaran. Guh ketibûn riyeke efsûnî, li xêmê binê beriyê li şop û doza.

Diwanzdeh siwariyan û Edûl lê digeriyan. Di vê şeva reş de guhdar bi çavê dil li ser dîwarê kilsî, li siya lehengên dîrokê temaşe dikir.

Piştî strana, "Delalê min wayê Delal" dayika min dest bi axaftinê kir, "Girê Edşanê bi rêwîtiya hespê riya rojekê li jêra Wêranşahrê dikevi. Derdora wî hetanî çahv çahva dibîne guherek bê kevir, dûz û dirêj e. Erdekî bi xêr û bêr e, tûkek deh tûka dide. Mirov tufî axê bike, ew tuf û xwezî wê bibe tov û jê mirov wê şax bide û biseride. Girê Edşanê jî li navbera vê berriya bêsînor wek kelekek li ser deryakê ye."

Min bi baleke mezin li dayika xwe ya çîrokbêj guhdarî dikir. Hêsrên tariyê xwe jê re kiribûn perde tije kortikê çahva min bûbû. Bi dengekî westiyayî û xemgîn min pirskir, "Dayê ti cara çûye Girê Edşanê, ser gora Dewrêş û hevalê wîna?"

### Gora dîlgirtî ya Derwêş

Dayika min ewilî hinekî sekinî û pê re got, "Na, hawar, keça min ma kî kane here ser Girê Edşanê?" Min hîn xwe amade dikir ku bi pirsiya û bigota ´çima?´, lê dayika min dewama gotina xwe anî û got,"Na keça min, sed heyf û mixabin ew Derwêşê ji bo axa dê û bava biparêze û li ser vê şopê canê xwe da, îro gora wî dîl hatiye girtin. Xelqê dora Girê Edşanê tev gund û eşîrê Ereban e. Nahêlin kesek here ziyaretiya gora Derwêş û hevalê wîna."

Ji wê êvarê û şûnda hetanî dawiya emrê xwe ez bûm dilê Edûlê bi hisreta wî Dewrêşê axa gelê xwe parast û îro gora wî dîl hatiye girtin naliyam, "Delalê min Wayê Delal..."

Silav li we,

Silav li çûk û mezina, li dayik û jina. Silav li çiyayên bilind, li çiya yê ji hawaran re bûne hêlîn û îro di paxila xwe da baz û pilingan şîr didin. Silav li geliyê Zîlan, li Newala Qesaba. Silav li her pê û bihusta axa birîndar. Sed silav li şax û newalên stûxwar, yê ku xwe ji cangoriya re kirine gor û war.

Silav li berriya jêrîn, berriya ji Derwêşan re bûye gor. Berriya axa sar bi sewta simê Hedvan, bi şingîniya şûr û mertalên, bi qîrîniya neçariya Edûlan dinale... Ji nalînên dora dengê Baqiyê Xudo bûye bask îro, bayê hawara êşa diweşîne. Awazên dengbêjan tîrê li guhê şopgerên li rastiya xwe digerin, dixîne.

Silav û mizgîn li Leyla Qasim kevoka li ser sêdarê. Piştî wê bi hezaran kevokên gerden gewr li ezmanê welatê ew bi hisreta wî dinalya, ji bo azadiyê îro per li hev dixin. Bi kulilkan şa dibin pînpînokên biharê.

Silav ji dergûşa dayika min re, dergûşa bi destê terikî, tilî û bêçiyê nasirî û bi sewta lorîk û lobîna dihat hêjandin. Ne hew şîr bû min ji pêsîra wê yeksûgê dimêt, di bin siya bijangên wê yê perpînpînokî de bi hêviyên reng kumyêt ez xwedî kirim û bi firê xistim, da ku ji bo siberojê ji hawara wê re bibim gazî.

### Ez Silava me

Ez hilma wê lorîkê, pêçeka wê dergûşê me, ew dergûşa ji dara berûyê... Ez êdî ne hew piçûka pepûka xwe me, hêz û cebira baskê wê yê şikestî me.

Wê têr ez hewandim, êdî dordem ya min e. Qanûn û zagonên xwezayê yê ne hatine nivisandin wisa dibêjin û wisa hatine stran li vê axa dilbirîndar.

Li dergûşa dayika min, li axa reh û can dabû min ji hêla hêzên reş ve ferman lê rabûbû û dê zarok diavêt. Mirovatî di bin siya şûrên destqirêjan de can dida. Qijikên reş ketibûn hêlîna kevoka min. Qîrîn û hawareke sedsalî dubare bilind dibû. Sînga axa lal diqelişî li hember vê neheqiyê. Guhên bi pifa lorîkên bi êşê hatibûn hewandin, li hemberî vê zilmê nikanîbûn bê sewt bimana. Li hilekê li dijî gelê min talan û fermanek bi êş dimeşiya û li hêlekê jî jin û mêrên vî gelî yên xwedî xîret mil dabûn hev û dîrokeke nuh bixwîn û xwîdana xwe dinivisandin. Govenda azadîyê li sergovenda xwe digeriya. Xeyalên mal û mêr, xeml, zîv û zêr bêwate mabûn êdî. Kêlî bûbû dîrok. Çarenûsa siberoja gelekî li ber diyarbûnê bû. Gav bi gav zivistanek reş û tarî xwe li gelê min dipêça. Ji bo qewitandina zivistanê û anîna biharê ez jî wek hezarên jin û mêrên bi xîret tevgeriyam û tevlî govenda azadîyê bûm.

> Çarenûsa siberoja gelekî li ber diyarbûnê bû. Gav bi gav zivistanek reş û tarî xwe li gelê min dipêça. Ji bo qewitandina zivistanê û anîna biharê, ez jî wek hezarên jin û mêrên bi xîret tevgeriyam û tevlî govenda azadîyê bûm. Ez berdêla azadiyê, bûka gelê xwe me. Ez Silava, Silava Efrînê me.

Ez berdêla azadiyê, bûka gelê xwe me.

We ez naskirim gelo?

Ez Silava, Silava Efrînê me. Şehîda Rojava ya jin, ya yekemîn, ez Silava me.

Silav li we.

** Silava, 28'ê Gulana 2013'an li bajarê Efrînê li derdora Çiyayê Kurmênc, di encama şerekî bi komên çete re tevî 4 hevalên xwe şehîd bûbû. Ew şehîda yekem a jin a Rojava ye.*

pîra min digo:
ji te re be umrê Meliko!
çend sal kiribû, min nepirsî
û pîrê jî negot, temenê kaliko!

çil ku hindik be
çaran bi ser çilî ve ke,
tu ji min bipirsî heke;
temenek salo salo purisî:
mindalî, koçberî, xizanî
herî pir jî ciwanî, ciwanî
ji te pê ve ma kê xwar?

Arjen ARÎ



WÊNE: BILAL GULDEM